KURMANCI

Härnösands kommun

# Bi xêr hatî pêşdibistanê



Niha demek bi heyecan li bendê ye, dema ku zarokê we dest bi pêşdibistanê bike. Dema li pêşdibistanê divê ewle be, perwerdeyî û xweş be. Em hêvî dikin ku hûn û zarokê kêfa xwe ji mayîna li cem me bibînin.



En förskola i världsklass

# Pêşdibistanek li çîna cîhanî

Di pêşdibistanên şaredariyê yên li Härnösandê, pêşbînî yên me pêşdibistanek li asta çîna cîhanî ye.

Em di pêşdibistanê de:

- xebata ku ji felsefeya perwerdehiyê ya Reggio Emilia hatî îlham kirin. Ev tê wê wateyê ku em zarokan wekî hemwelatiyên civakê yên jîr û girîng dibînin ku hêjayî guhdarîkirinê ne. Em cûdahiyan teqdîr dikin û wan di karsaziyê de wekî sermayeyek dibînin.
- alîkariya zarokan dikin ku ji devkî bêtir ziman pêşve bibin. Ne herî kêm helwestên estetîk û empatîk ên ku zarok di hînbûna û lêgerîna cîhanê de bikar tînin. Em amûrên dîjîtal wekî yek ji zimanan dibînin û dixebitin ku zarok jêhatîyên dîjîtal ên kêrhatî pêşve bibin.
- cihêrengiyê dewlemend dike û pirzimaniyê jî wek hêzekê dibîne. Em bi awayekî aktîf dixebitin ku zarokên bi zimanê zikmakî ji bilî swêdî hem zimanê xwe yê zikmakî u hem jî zimanê swêdî bi pêş bixin.
- bi awayekî aktîf dixebitin li ser bingeha Peymana Mafên Zarokan.

När ditt barn börjar i förskolan

# Dema ku zarokê we dest bi pêşdibistanê dike

Ji bo we û zarokê we, di roja yekem de ku hûn ê bêyî hev bin, dikare hestyarî be. Ji ber vê yekê em ji bo we bi “hînbûna dibistanê” dest pê dikin. Hûn dikarin ji me bipirsin û hewcîdarîyên zarokê we ji mere re bêjin. Hûn jîngeha li pêşdibistanê dibînin û keşif dikin û herweha karmendên û hevalên nû yên zarokê nas dikin.

Inskolning

# Hînbûna dibistanê

Di pêşdibistanê de, em hînbûna dibistanê ya dêûbav-aktîf bikar tînin. Ev tê wê wateyê ku hûn an jî kesek din ku zarokê baş nas dike, di hînkirin û rûtînên ku hûn di dema hînbûna dibistanê de pê re rû bi rû dimînin bi aktîv bi zarokê re ye. Hûn pir girîng in di van rojan de li pêşdibistanê ji bo zarokê xwe. Bi piştrastî ya we de û em li pêşdibistanê têkiliya xwe bi zarokê re ava dikin.

Divê ku zarokê we di nav aramî û rehetî bi we re hawirdora nû nas bike, em mamoste û zarokên li pêşdibistanê. Hûn ê perwerdehiyê de fêm bikin û me perwerdekar û zarokên din ên di grûpê de nas bikin. Demjimêra hînbûna dibistanê bi hewcedariyên zarokê we ve girêdayî ye. Hûn dikarin bi qasî hefteyek hînbûna dibistanê hesab bikin û di wê demê de hûn ê li pêşdibistanê bin.

Em di dema hînbûna dibistanê de bi we re têkiliyek ewledar hêsan dikin bi rêya:

- hûn di dema hînbûna dibistanê de li zarokê xwe xwedî derdikevin. Guhertina poşek, kinc li xwe kirin û ji kinc xwe kirin û hwd.
- pedagog nêzikî we ne û dema derfet çêdibe bi zarokê re têkilî çêdikin.
- di dema hînbûna dibistanê de hûn bi me re bin heta ku hûn û zarokê we bi me re bi rehetî bihisin. Zarok ne hewce ye ku pratîka hiştinê bike. Em zarok perwerde dikin ku bi me re be.
- em bi hev re biryarê bidin ka dema terkandina zarokê ye.

Måltiden – en del av lärandet

# Danê xwarinê – beşek fêrbûnê ye

Di pêşdibistanê de xwarin beşek ji karê lênêrînê û perwerdehiyê ye. Li gor dirêjiya mayîna zarok, taştê, fêkî, firavîn û xwarin di demên diyarkirî de têne dayîn. Ma zarokê we hewceyê xwarina taybetî ye? Wê hingê divê hûn wê agahdar bikin bi riya e-xizmeta www.harnosand.se




Förskolornas öppettider

## Saetên vekirina pêşdibistanê

Em di rojên hefteyê de herî zû di saet 06:30 de vedikin û herî dereng di 18:30 de digirin. Demjimêrên vekirina pêşdibistanên me li gorî şema yên pêşkêşkirî yên zarokan û têne guherîn li gorî hewcedariyên zarokan- ihtîyaca grûpê. Heke hûn hewce ne ku şema xwe biguherînin û saetên vekirina pêşdibistanê (di navbera 06:30-18:30 de) dirêj bikin, divê hûn ji berê de, herî kêm 14 rojan bi mamosteyan re biaxivin. Ger carek din hewcedariya we bi lênêrîna zarokan hebe, hûn dikarin ji bo cîhek li Nattis ya şaredariyê serlêdanê bikin.

Hûn dikarin guhertinên şema yên demkî raghînen platforma fêrbûnê u herweha pêşdibistanê.

Lämna och hämta

## Teslîm kirina û birina Zarok

- Di dema bernameya lihevkirî zarok bînin û biben. Girîng e ku hûn her gav bi karmendan re têkilî daynin dema ku hûn zarok datînin û dibin.
- Her dem pêşdibistanê agahdar bike heger kesek din zarokê we bibin.

Lägg in barnets schema i lärplattformen

## Di platforma fêrbûnê şema ya zarokê qeyd bikin



Di platforma fêrbûnê de, hûn şema qeyd dikin, nehatina zarokê we û radigihînin û ji pêşdibistanê agahiyan distînin.

Ger hewce be, rêveberiya dibistanê dikare bi riya platforma fêrbûnê agahdarî ji hemî serperiştê (welîyê) zarokan re bişîne.

Heger hûn hewce ne ku şema xwe biguherinin û demên xwe dirêj bikin, hûn hewce ne ku ji berê de, herî kêm 14 rojan bi mamosteyan re biaxivin.

Frånvarande

## Nehatin

Heger zarokê we rojekê li malê bimîne, divê em herî dereng zanibin berî saet 08.00 ji bo ku em roj plan bikin. Heger zarokê we li malê bimîne, zarokê wekî neamade di platforma fêrbûnê de binivîsin an jî telefon bikin û beşa xwe agahdar bikin. Ji kerema xwe rojek berî ku zarokê we vegere pêşdibistanê me agahdar bikin.

Di nehatina mehekê an jî dirêjtir de bêyî lihevkirinê, cîh zarok tê hesibandin ku hatî ye betal kirin.

Föräldrainflytande

## Bandora dêûbav

- Em hevpeyivînên hînbûna dibistanê, hevpeyivînên ê dewam piştî hînbûna dibistanê û salê carekê hevpeyivînên pêşkeftinê dikin.
- Em û hûn civînên rojane dikin li ser hevkarî yê li dora zarok dema ku hûn zarokê xwe dibin û tînin
- Salê carekê em we vedixwînin civîna dêûbavan.
- Di pêşdibistanan de meclîsên dêûbavan hene ku tê de derfeta we heye ku hûn tesîrê li tiştên ku li pêşdibistanê diqewimin bikin.
- Bi we re, em anketek li ser kîjan zimanên ku zaroka we pê re rû bi rû maye, pêk tînin, em her sal anketê dişopînin.

Allmän förskola

## Pêşdibistana giştî

Pêşdibistana giştî bêpere ye. Mafê hemû zarokan pêşdibistanê giştî ji termîna payîza sala ku zarok 3 salî ya xwe temam dike heye. Saetên vekirinê 8:30-13:30 Sêşem-Pêncşemê hefteyên ê ne tehetîl. Di tehtîlê de pêşdibistana giştî tune ye. Em sala xwendinê ya dibistana seretayî dişopînin, ew li www.harnosand.se hene.



När kan ditt barn vara i förskolan?

## Zarokê we kengî dikare here pêşdibistanê?

- Qaida sereke ev e ku heger hûn betal bin, zarokê we jî betal bin. Hûn nikarin zarokê xwe li cem me bihêlin dema ku hûn li tehtîlê bin.

- Mafê zarokê we heye li pêşdibistanê be di wan saetên ku hûn li kar bin an jî li dibistanê xwe bin.

- Heger hûn di betlaneya dêûbavbûnê de bin an jî bêkar bin, zarokê we dikare her hefte heta 15 saetan dersa pêşdibistanê bistîne. Ev 15 saet ji nîvsala payîzê ya ku zarok dibe sê salî, bêpere ye, zarokên yek û sêyan xercê didin. Demên ku têne sepandin sêşem-pêncşem 8:30-13:30 ne lê ne di dema betlaneyê de. Em sala xwendinê ya dibistana seretayî dişopînin.

- Hûn ku biîzinbûna dêûbavêtinê an jî li kar digerin, dikarin ji bo ku zarokê xwe di dema tehtîlê de li pêşdibistanê bihêlin, xercek bidin. Heger zarokê we yek heta sê salî be, hûn jî ya ku tehtîlê hilnebijêrin, xercek bilindtir didin. Hûn bijartina xwe di e-xizmetê de dikin. Demên ku di tehtîlê de derbas dibin sêşem-pêncşem 8.30-13.30 ne. Lêbelê, ne di meha tîrmehê de. Yan jî lêgerînerê kar kar dikarin xercek bidin ji bo ku hûn zarok xwe li pêşdibistanê bihêlin 15 seat di dema tehtîlê de hûn nikarin zarok li cem me bihêlin di dema tehtîlê de yan jî di meha tîrmehê de. Heger hûn pere bidin ji bo ku tu zarokê xwe li pêşdibistanê bihêlin di dema tehtîlê de, hûn ê di nava 12 mehên pêşîn de nikaribin bijartina xwe biguherînin û hûn ê her meh fatûreyek wergirin.

- Heger tu penaxwaz (ilticakar, starexwaz) bî, mafê zarokê te heye ku bê pere li pêşdibistanên giştî di hefteyên ku ne tehtîle be. Ew ji demsala payîzê ya sala ku zarokê we dibe sê sal, ji sêşemê heta pêncşemê 8.30-13.30.

Heger hewce bike pêşdibistan dikare ji kardêr, organîzatorên xwendinê an jî kaseya bêkarî (A-kassa) bi rêya serperiştê (welîyê) zarokan  belge bixwaze. Zarokên ku di pêşveçûna xwe de hewcedariya wan bi piştgirîyek taybetî ne û zarokên ku ji ber rewşa malbatê bi gelemperî hewcedariyên wan hene, li gorî hewcedariyê çalakiyên pêşdibistanê têne pêşkêş kirin.

Planerings-och fortbildningsdagar

## Rojên plankirin û rojên perwerdehiyê

Salê çar caran rojên me plansazkirin û berdewamkirina perwerdehiyê heye da ku karmend bibin xwedî derfeta pêşvebirina jîrbûna (kompetens) hevbeş. Heger derfeta we tune ku hûn ji kar biîzin bin, em çalakiyên pêşdibistanê pêşkêş dikin, lê tenê bi karmendên cîgir. Çalaki dikare di navbera çend yekîneyan de bêne koodrîne kirin. Heger di van rojan de cîhek ji bo we hewce bike, divê hûn herî kêm 14 roj berê me agahdar bikin.

Vårdnadshavares semester och juli månad

## Tehtîla/Semestera serperişte zarokan û meha Tîrmehê

Di dema tehtîlê de û cejnên demdirêj, çalakiyên pêşdibistanê dikarin di navbera çend yekîneyan de bêne koordîne kirin. Dema ku serperiştê (welîyê) zarokan ji karê xwe biîzin be, divê zarok jî ji pêşdibistanê biîzin be. Carinan piştî danûstandina bi midûrê dibistanê de îstîsna dikare were kirin, lê ne di meha tîrmehê de. Ji bo her serperiştê (welîyê) zarokan her sal herî zêde pênc rojên tehtîlê de îstîsna dikare were çêkirin, lê ne di meha tîrmehê de.

Di meha tîrmehê de, çalakî tenê pêşkêş kirin têne ji bo serperişte (welîyê) zarokan ên ku kardikin an jî dixwînin. Di van hefteyan de, divê hûn belgeyek xwendinê an jî belgeyek ji kardêrê xwe bidin. Lêgerînerên kar zarokê xwe di meha tîrmehê de ji bo çalakiyê pêşdibistanê qeyd nakin, lê eger karekî bi dest bixin an jî dest bi xwendinê bikin yekser mafê wan ê cih heye.

Avgift

# Xerc

Her mehê hûn xercek didin. Bihabûna xercê bi dahata (meaşê) we ve girêdayî ye, lê  sînorkirî ye bi tarifeya herî zêde. Heger hûn agahî li ser dahata (meaşê) we nedin me, hûn tarifeya herî zêde bidin.

Uppsägning

# Betal kirin cihê zarok

Agahdariya betalkirina cîhe zarok divê herî dereng du meh beriya ku zarok dev ji pêşdibistanê were kirin. Em xercê distînin di dema dawîanîna cihê zarok tev ku hûn cihê zarok bikar neynin. Ji bo zarokên ku dest bi sinifa pêşdibistanê dikin, cihê zarok tê dawîkirin di 1ê tîrmehê heger serperiştê (welîyê) zarok cîyê pêşdibistanê berî wê bidawî neyne. Heger piştî 1ê tîrmehê pêwîstîya (ihtîyaca) we bi lênêrînê hebe, hûn bi rêya e-xizmetê serlêdana cihkirina piştî dibistanê dikin.

Sjukdomar

# Nexweşî

Rewşa giştî ya zarokê diyar dike ka zarok biçe pêşdibistanê yan na. Rojên li pêşdibistanê bi lez û bez in û ew bêtir hewce dike zarok ji malê li pêşdibistanê be.

Dema teslimkirina zarok li pêşdibistanê, divê ku zarok saxlembe be û bikaribe tevahiya rojê bidomîne. Li pêşdibistanê de, zarokên saxlem bi hevalên xwe yên saxlem re hevdîtin dikin. Em hemî alîkariya hev dikin ku enfeksiyonê belav nekin.

heger zarok di pêşdibistanê de nexweş bibe, em ê telefon bikin û hûn dikarin werin û zarokê bibin. Karmendên pêşdibistanê biryarê dide ka zarok têra xwe saxlem e ku beşdarî perwerdeyê bibe.



Magsjuka

## Nexweşî ya zikê (mîde)

Zarok herî kêm 48 saetan piştî nîşanên dawîn divê li malê bimîne. Bînin bîra xwe ku nîşanek jî dikare ew be ku zarok naxwaze xwarinê bixwe. Em ji we dixwazin ku hûn zarokê xwe li malê bihêlin heger nexweşi ya mîdê bi  xuşkûbira yê zarok hebe.

Feber

## Germahi (ta, heraret)

Zarok bi kêmanî rojekê bêyî germahî li malê dimîne berî ku ew vegere pêşdibistanê.

Ögoninflammation

## Iltîhaba (kulbûna) çavan

Divê zarok li malê bimîne heger ew çavzeliqî be û mîkropgirtî (nêmgirtî) be.

Medicin

## Derman

Ji bilî ku lihevkirine em derman nadin zarokan wek nimûne dermanê astma (tengnefesî) û alerjiyê di dema hewcedariya lezgîn de.

Ji bo pêtir agahdarî li 1177.se binêre.

Kläder på förskolan

# Cilên (Kincên) li pêşdibistanê

Li vir lîste ya cilên ku em dixwazin hûn li pêşdibistanê bihêlin ji bo ku em li zarokan we bikin gava ku zarok li derve bin. Divê cilên zarokan bi navê wan bên nîşankirin.


| Payiz û bihar | Zivistan | Havîn |
|---|---|---|
| Cizme batankirî | Cizme batankirî ê zivistanê | Pêlavê bezîn (revê) |
| Komê (Kulavê) tenik | Komê (Kulavê) germ | Şewqeyê tavê |
| Daestgorik (lepikên) tenik | 2 cot lepikên germ | Cizme nebatankirî |
| Lepikên betankirî | Berstuka qirik | Vezelê milkurt û mildirêj |
| Cilên fleece | Tulûm | Krema faktora parastina ji tav |
| Bi dilxweşî cilên baranê ê batankirî | Goreyên qalind | Cilên baranê |
| Şalê rûbendkirinê de, ji bo parastina cil | Vezla (fanêle) germ | Çakêtê (montê) tenik |
| Çakêtê tenik ji bo parastina ji baranê û bayê | | |

Di pêşdibistanê de pêdiviya zaroka we jî bi kincên zêde heye.

| | |
|---|---|
| 2 heb | Vezelê mildirêj |
| 2 heb | Vezelê milkurt |
| 3 cot | Şal (pantalon) |

| | |
|---|---|
| 3 cot | Gore |
| 3 heb | Derpîyê lawan anjî derpêyê keç |









Bra att veta

# Baş e ku bizanin

- Hewce nake ku hûn poşeka (paçê bin zarokan) zarokê xwe ji malê bînin. Poşekên hene ji bo zarokê we dema ku zarokê we li pêşdibistanê de dimînin.
- Zarokên ku li pêşdibistanê qeydkirî ne li hember qezayan sîgorte kirîne. Di malpera şaredariyê de agahiyên li ser sîgorta qezayê hene.
- Ji bo ku zarok di pêşdibistanê de destpêkeke baş bike, pêwîstî ku zarok xwarina hişk bixwe berê dema hînbûna dibistanê.
- Di pêşdibistanê de em bala xwe didinê pîroz kirina rojbûna hemû zarokan, wek nimunê bi stran û xwendina çîrokan. Em bi tiştekî xwarinbar pîroz nakin.
- Em hewl didin ku xwarina şekir kêm bikin, lê dibe ku di cejn û şahiyên taybetî de tiştek zêde wekî qeşîr (dondirme) pêşkêş bikin. Heger hûn vê yekê naxwazin, karmendan agahdar bikin.
- Em naxwazin ku mirov tiştên şîrîn û xwarinên din ji malê bînin pêşdibistanê.
- Di pêşdibistanê hebûna xwarin, kulîçe (kêk) yan jî tiştên din ku şopên wek fisteq, bihîv (badam), tovê kuncîyan tê de hebe qedexe ye ji ber alerjiyê (hesasîyetê).

Anmälningsskyldighet

## Mecbûrîyeta agadarikirinê (gilîkirinê)

Hemû xebatkarên pêşdibistanê mecbûr in ku li gorî beşê14 §1 Qanûna karûbarên Civakî rapor (gilî) bikin. Ev tê wê wateyê ku karmend bi qanûnê mecbûr in ku guman an tirsa ku zarokek di xetereyê de ye ragihînin. Ew ji bo berjewendiya zarok û malbatê tê kirin, da ku ew piştgiriya ku hewce dike bistînin. Xebatkarên pêşdibistanê lêkolîn nakin ka tirs rast e an na, daîreya karûbarên civakî lêkolîn dike.

Sekretess

## Sirveşartinê

Li gorî beşa23 §1 ya Qanûna eşkerbûn û nehênîbûnê di nav pêşdibistanê erkê sirveşartinê tê bi cî kirin. Kesek ji me ku li pêşdibistanê dixebitî, destûr nayê dayîn ku li ser rewşên kesane bêje, heger ne diyar be ku ew agahî bêyî ku kesek yan jî kesekî nêzîkî wî ji wan agahiyan bê zerar bê gotin.

Aga – fysiskt/psykiskt våld är olagligt

## Lêdan (lêxistin) – şîdeta laşî/derûnî neqanûnî ye

Bikaranîna şîdetê qedexe ye. Di nav malbatê de, bi taybetî giran e. Bo nimûne, ew dikare tundûtûjiya li dijî zarok, jin, mêr an hevjînek be. Tundûtûjî dikare bibe dehfdan, lêdan an kulmek li rû bw. Her weha dibe ku mirov bitirsîne an jî hestên mirov biêşîne.

Styrdokumenten: Skollag och Läroplan (Lpfö-18)

## Belgeyên bi rêve birin: Qanûna Dibistanê û plana Perwerdeyê (Lpfö-18)

Qanûna Dibistanê, di nav tiştên din de, maf û erkên zarokan û serperiştê (welîyê) zarok wan bi rê ve dibe.

Di plana perwerdiyê de bingeha nirxandin û etik ku pêşdibistanê li ser disekine û kîjan perwerdehiyê ku ji mafê zarok heye di dema xwe ya pêşdibistanê de.

Divê hemû pêşdibistan li gorî belgeyên rêveberiyê tevbigerin. Pêşdibistan formek perwerdehiya dilxwazî ye ku ne mecbûrî ye. Zarok di pêşdibistanê de xwedî mafê perwerdehiyê ne û dema ku serperişte (welî) dixebitin an jî dixwînin divê hewcedariya wan a çavdêriyê jî were dîtin.



**Hûn û zarokê we ji dil bixêrhati pêşdibistana me.**

*Em li hêviya hevdîtina we ne!*

Härnösands kommun